Newroz Hejmar (73) Rûpel (5) Nîsan 2007z – 2619k

Cejna Newroza 2007 an

Îsal jî weke hersal , li êvara 20an , gelê me yê Kurd li Sûriyê bi mûm û find , û aletirîkên rengareng li ser xanî û balkonan , vêxistina agiran li ser gir û çiyan , li darxistina meş û

festîvalan li kastîn , xaringeh û şariyan , bi çepik , stiran û lîliyan , dahol û zurnan û reqis û seman pêşewaziya NEWROZA xwe , Newroza azadî, astî û wekheviyê

Newroza Cezîrê

Cezîrê , Reqê , Kobaniyê , Heleb , Efrîn , Laziqiyê û Şamê gelê me bi keç , xort, kal , pîr , jin û mêran ve berê xwe dane siruşt û xwezoya şêrîn , cîgehên şahiyên cejna NEWROZê . Û bi hemî aw û şêweyên şabûnê yên naskirî û pê zanîn bi coşeke mezin NWEROZa xwe zindî kirin .

Hêja ye em bipirsin , çima di hemî çalakiyên îsal de , tu bûyer kambax û nexweş weke hersal derneketin holê ? Milet yê hersal e . Cejin , bûyer û çalakî jî yên hersal in .

Di baweriya me de , bersiv ev e : Gelê me hertim azadîxwaz û aştîxwaz e , eger kes dest tê nede . Tenê destlatê îsal çavsorî li me kêmkir

Heval Nezmî jî barkir

Nezmî Kurê hesen , di sala 1962 an de, li gundê Çençeliya, ji dayîk dibe. Di sala 1991 an de, derbasî nav refê partiya Yekîtî dibe.Di 28ê Nîsana 2007 an de, piştî nexweşiyê. Dilê wî radiweste. Bi beşdariya xwedî, hogir û hevalên wî, di goristana gund e tê veşartin. Li ser gurnê, gotina partiya wî tê xewndin : Naveroka gotinê ev bû .

Gelî beşdaran ….

Îro kombûna me li ser goristana **Çençeliya** ji bo goçbarkirina hevalê me yê hêja Nezmî, heval Nezmî ji nav me barkir.L lê kar û liva wî, ji bo gelê xwe li ber çavên me ye. Armanc û hîviya hevalê me ku, gelê me jî weke hemî gelên cîhanê bi serbest û azadî bijî .

Bila serên mal, xwedî , hogir û hevalan sax be.